Bi Navê Xwedê

# Tebateka Zehraî

## Hz. Zeyneba Kubra (s.a)

Ji bo grupa 10-15 salî

Tebateka Zehraî

Nivîser: Mehdî Wehîdî Sedr

Amadekar: Komgeha Cîhanî ya Ehlê Beyt – Ninîsgeha Wergêrî

Lêkolîn: Muhemmed Hadî Yûsifî Xerewî

Wergêr: Mucteba Subhî

Derhênerê Wêne: Seyyid Muhsin Mûsewî

Wêne: Hekîme Şerîfî

Grafîk: Şirketa Sîmaya Nûr a Kewser

Rengandin: Zehra Semewatî

Paşnêr: Mucteba Subhî

Weşanger: Weşanên Nîhal

Yezîdê Muawîye, biquretî pal dabû ser textê seltenetê û xayînan li derdorê wî jî jê re meliqî dikirin. Îcar piştî bûyera Aşûra, malbata Îmam Huseyn (a.s) teva ji bona wî êsîr kiribûn û wî xwe li hemberê zarok û jinên dest û pêyên wan girêdayî, serketîyê meydan didît. Yezîd bêşermezarî li hemberê Ehlê Beyta Resûlullah (s.a.a) bi xwendina helbestekî nebaş û ji Hz. Huseyn (a.s) re zimandirêjî dikir. Dengê girînên malbata Îmam Huseyn (a.s) dewan dikir û ji ber şehedeta Îmam Huseyn (a.s) agir ketibû dilên ewlad û dostan wan û lehzekî jî neditemirî. Di wê demê de keçika Mîrê Bawerdaran (a.s) ku her wext li cem birayê xwe Seyyidê Şehîdan (a.s) li deşta Kerbelayê bû, ji gotinên beredayî yê Yezîd êdî sebir nekir û bi zimanek Heyderî, bi xîretek Huseynî û îffetekî Zehrayî li beranberê sitemkarê serkêş yê wê demê, axaftina xwe ve weha dest pê kir: “Hemd û sipas taybetê Xwedê Teala ye ku Rebbê alemê ye. Silav li bapîrê min bû ku mezînê resûlan e. Xwedê Teala rast gotîye ku: “Dûmahîk kesên ku dikevin nav amelên xirab, digihîjin cîhekî ku ayetên Xwedê înkar dikin, tinaz û loma lê dikin”.

Ey Yezîd! Tu difikirî ku te dora zemîn û tava asîmanê li me teng kirîye, te rêya çareserîyê li ber me girtîye heta ku me wekî dîlan bikişînî herderê. Em li cem Xwedê kêm û piçûk in û tu jî biqîmet û mezin î? Ev bandûra te li ser me gelo li ba Xweda diyara mezinatî û rûmeta te ye? Ji ber vê yekê te pozê xwe bilind kirîye qure bûyî û kêfxweş î ku dinya di bin destê te de û êsîrê te ye, karên te xweşik, milk û meqama rêberî ji bona te pêk hatîye. Îcar hinek hêdî û bisekine, gelo te gotina Xwedê ji bîr kirîye ku dibîje: “Ewên ku bûne kafir û ketine rêya tuxyanê, bila nefikirin ku eger me firsendek daye wan bi feyda wan e; em muhlet didin wan ku bila li gunehên xwe zêde bikin ku ezaba xor û piçûk kirin ji wan ra ne”. Ey kurê kesên ku bapîrê me Pêxemberê Xwedê (s.a.a) di zefta Mekkê de we êsîr kirin û pişt re azad kir. Gelo ev edalet e tu jin û qewreşên xwe pişt perdê de vedişêrî û keçikên Resûlê Xwedê (s.a.a) bi êsîratî li vî alî li wî alî ve bikişînî? Perdeyê wan didirînî û rûyê wan vedikî heta ku dijminan, wana ji bajarek dibin bajarekî din û nas û nenas zûr bibin li wan mêze bikin. Nêzîk û dûr, birûmet û bêrûmet li rûyê wan dinêhêrin. Ji zilamên wan ne parêzgirek maye ne jî alîkarek. Bi rastî çawa omîda dilsotin ji kurê kesekê hebe ku devê wê, cîgera mirovê pak çût û dûr ve rijand. Goştê wê ji xwîna şehîdan xurt bûye û çawa di dijminatîyê de ji malbata me re lez nekin û nexwe bi çavên kîndar û dijminatî li me dinêhêre. Bê wê ku xwe gunehkar bizanî û mezinatîya vî guneh û kancîyê fêhm bikî, dibêjî: “Xwezîya bavên min jî li vir bûna û şahî bikirana û ji min ra aferîn bigotana…” Bi darekî bambû diranên Hz. Huseyn (a.s) serwerê ciwanan yên bihiştê nîşan dikî û li lêv û diranên wî dixî? Çima weha nebêjî. Te qaçilê birîna dilê me rakir, dirandî û qelandî. Bi vê xwîna ku ji malbata Hz. Muhemmed (s.a.a) û stêrkên birqînên ser erdê ji ewladên Abdulmuttelib te rijand û gazî bavên xwe dikî, goman dikî ku dengê te here wan, lê belê ewê ji nişka ve cîhê ku ew li wêderê ne, tu jî herî û wê demê tu ê bixwazî ku xwezîya destê te sist bibûya zimanê te lal û weha qise nekira û karê ku te kirîye û nekiribûya. Ya Rebbî! Heqê me ji wan bisitîne û ji ber ku li me sitem kirin, heyf bigire û xişma xwe li ser kesî de birêje ku xwîna me rijand û dostên me kuşt. Ey Yezîd! Sond ji Xwedê re te xêncî çermê xwe (tiştekî din) nedirîdî û te xêncî goştê xwe (goştekî din) jê nekir. Bi rastî ev car bi rijandina xwîna malbata Resûlê Xwedê (s.a.a) û ji navbirina hurmeta malbat û lêzimên wî, te li ser xwe girtîye tu ê herî cem Pêxember (s.a.a). Di wê demê de Xwedê Teala ewê hemûya bicivîne û ewê belav bûyîya wan bi civînê ve biguhirîne û ewê heqê wan paşda bigire. Her weha Xwedê Teala kerem dike:

“Tu car goman neke ku ewên di rêya Xwedê de tên kuştin, miribin; belkî ew zindî ne û li bal Xwedê rizq didin wan”. Ji te re ev bes e û Xweda hakim e û Hz. Muhemmed (s.a.a) dozdarê me û Cebraîl jî piştîvanê me ne. ji nişka ve ew kesê ku te xapand û te siwarê sitûyê xelkê kir (ango Muawîye) ewê fêhm bike ku ji bona sitemkaran dawîyeke nerind heye û ewê fêhm bike ku ji we kî cîhê wî xirabtir û leşkere wî zeîftir e. Eger çi dahatên nexweşê rojê, min kişande navê û bi te re qise bikim, lê bizan li gor min qîmeta te tune û lomeyê herî mezin û melametek gelek zêdeye ji te re heye.

Lê ez çi bikim ku hemû çavan tijî hêstir, hemû singan dişewitin. Haydar be ku sedema ecêbmayî û gelek ecêbmayî ye ku kesên paqij alîgiri Xwedê, di şer de bi alîgirên şeytan re ku koleyên azadbûyî bûn bi destê wan tên kuştin û xwîna me ji penceyên we dirije û goştên me ji devên we dikeve û ev bedenên pak û paqij her dem bû xwarina gurên dirende û di bin pencikên çêjikên keftaran, li erdê hatîye kişandin. Û eger îro tu me ji bona xwe xenîmet difikirî û tu ê ji nişka ve bibînî em ê bibin sedema zîyana te û ew demeke ku her çi te ji pêş şandîye tu ê bibînî û Rebbê te sitemê ji bo bendeyan rewa nabîne, ez ê gilî û tewekkulê Xwedê bikim…”

Hz. Zeyneba Kubra bi diyarîya xwe, Yezîd û yezîdîyan li hemberê dost û dijminên Ehlê Beyt heya ebed rezîl û riswa kir. Peyama Aşûra ya Huseynî bi dengekî Heyderî gihande hemû guhên mirovên azad, ji ber vê yekê heya navê Huseyn (a.s) jiyîya, ewê navê Zeyneba Kubra jî bijî.

Nasname:

Nav: Zeyneb

Leqeb: Eqîleya benî Haşîm

Temen: 57 sal

Wefat: 15-ê Receb sala 62-ê koçî

Cîhê defin: Şam (Demişq)

Çavkanî:

Meclisî, Bihar’ul-Enwar, cild 45, rûpel 133

Tebersî, El-Îhtîcac, cild 2, rûpel 34-35

Komgeha Cîhanî ya Ehlê Beyt, ji bo belavkirina çand ya Îslamî 48 cild berhem ji bo zarokên delal pêk anîye. Em ji dê bav, mamoste û xwedevanên hêja tika dikin ku nêrîn, pêşniyar û rexneyên xwe bi navnîşana jêr ve bişînin.

Navnîşan: Haznedar Mah. Şevketdağ Cad. No: 67/A Güngören / İstanbul

Tel: 0090 212 555 1 666

Faks: 0090 212 555 2 212

Malper: www.nihalyayinlari.com

e-mail: info@ nihalyayinlari.com